## Rêbaza “Zimanek Kesek”

Rêbaza “Zimanek Kesek” metodeke navder e ku ji aliyê gelek malbat an jî saziyên perwerdehiyê tê sepandin ji bo mezinkirina zarokên duziman an jî pirziman. Di hêlîna Pîya de em jî vê rêbazê bikartînin ji bo zarokên xwe duzimanî, di Kurdî û Almanî de, perwerde bikin. Di Pîyayê de zarokên we ji aliyê du mamosteyan werin mêzekirin, yek ê tenê Kurdî biaxive yek jî Almanî. Di destpêkê de, dibe ku zarok bi “zimanê din” bersiv bide, lê bi saya rêbaza me, ew ê piştî demekê zimanan û kesan li hev bîne, bizane divê bi kê re kîjan zimanê biaxive.

Li gorî lêkolîneke zanîstî ji aliyê Annick De Houwer hatiye birêvebirin, %75ê zarokên bi vê rêbazê hatine mezinkirin di encamê de bûne duziman, helbet li gorî xurtbûna sepandina rêbazê. Serpêhatiya me ya sê salan jî nîşan da ku bikaranîna metoda perwerdehiya duzimanî bi awayekê daîmî çêtir e ji bo pirzimanîmezinbûna zarokan.



## Hêlînên Me

**Kita Pîya Kreuzberg**
Muskauer Straße 44, 10997 Berlin
Phone: 030699531180
Fax: 030699531181
Mail: kita-piya-kreuzberg@yekmal.de
yekmal.com/category/kita/kita-kreuzberg

**Kita Pîya Wedding**
Barfusstraße 13, 13349 Berlin
Phone Büro: 03045082694
Phone Kita: 017652923646
Mail: kita-piya-wedding@yekmal.de
yekmal.com/category/kita/kita-wedding/

**YEKMAL**
Komeleya Yekitiya Malbatên
Kurdistanê li Berlîn


Waldemar Strasse 57, 10997 Berlin
Phone: +493061625848
Mail: info@yekmal.de

www.facebook.com/yekmal
Malper: https://yekmal.com
Saetên Kar: Du-În 10.00 – 18.00

# Pîya

Bilinguale - Kita

Deutsch/Kurdisch





KITA PÎYA

## QADÊN ME YÊN HÎNBÛNÊ

- Pêşveçûna Jiyana Civakî û Çandî
- Pêşveçûna Tenduristî
- Pêşveçûna Zimanî
- Pêşveçûna Hûnerî
- Pêşveçûna Matematîkî
- Pêşveçûna Xweza, Derûdor û Teknolojî

## Pêşwendiyên Duzimaniyê

Kesên duziman:
- afirînertir, berfirehtir û rewantir difikirin
- Xweyî zanîna du an jî zêdetir serboriyên jiyanê ne
- Xwendekarên duziman di waneyên xwe de serkeftîtir in
- Du an jî zêdetir zimanan de dikarin bixwînin û binivîsin
- Çêtir dikarin têkiliyan deynin û danûstandinên wan ên civakî xurttir in
- Bi nasnameyê xwe serbilind, ji bo çandên cuda xweşbîntir, û dijî cudageriyê dibin
- Zimaneke nû hêsantir û bi leztir hîn dibin

## Nêrina Me ya Pedagojîk

Li şûna em tenê yek nêrîneke civakî û pedagojîk bişopînin, hêlînên me nêrîneke pir-alî dide ber xwe derbarê hînbûn û pêşveçûnê de di perwerdehiya zarokên piçûk de. Ji bo vê yekê, em aliyên cûda yên nêrînên rewş (situation), serfiraziya pêş (early excellence), hînbûna ser bingeha hûnerê û duzimanî tînin cem hev. Her yek ji van aliyan bi yên din re girêdayî ne û her yek xweyî nîvendên taybet in di xebata me de.

## ROJEKÊ ME

- Xêrhatin
- Taştê
- Xwepaqijî
- Çembera Sibehê
- Çalakiyên Hînbûnê
- Xebatên Çand û Hûner
- Firavîn
- Bêhnvedan / Razana Nîvro
- Fêkîxwarin
- Lîstina derve
- Dema serbest
- Projeyên Hînbûnê
- Xwatirxwestin